# BERNAMEYA PSKÊ

## DESTPÊK

Di nav gelên Rojhilata Nêzîk û Rojhilata Navîn de yek ji gelê herî resen û kevnare kurd in. Her wisa jî ji bilî parçeyê başûr ku di nav sînorên Iraqê de maye, yekem netewe ye ku ji hemû mafên xwe yên neteweyî û demokratîk bêpar maye. Axa Kurdistanê ku bi hazaran sal e gelê me li ser dijî, bi kolonîzekirinê hatiye perçekirin.

Kurdistan, cara yekan di sala 1639an de bi Peymana Qesra Şîrîn ku di navbera Împaratoriya Osmaniyan û Îranê de pêk hat, hat dabeşkirin. Ji ber şer û talanên van her du dewletan ku li ser axa Kurdistanê dihatin kirin, welatê me hat şewitandin û wêrankirin. Pêşkeftina çandî û civakî hat astengkirin.

Her çendî ji destpêka sedsala 19an ve gelê kurd ji bo bidestxistina mafên xwe yên neteweyî bi dehan car serî hildabe jî, her tim bi lihevkirin û hevkariya van her du împaratoriyan û bi alîkariya dewletên

dagirker ên rojavayî bi xwînê hat serkutkirin.

Piştî Şerê Dinyayê yê I. Kurdistan carek din hat dabeşkirin û bû çar parçe. Beşeke mezin a Başûrê Kurdistanê, ji aliyê îngilîzan ve bi ser Iraqê ve hat berdan ku di bin serweriya wan de bû. Herêma Başûrê Rojava ya Kurdistanê ku ji aliyê neftê û çandiniyê ve gelek dewlemend e, ji aliyê Fransizan ve bi Sûriyeyê ve hat girêdan ku di bin serweriya wan de bû. Îranê para xwe ya berê parast. Parçeya herî mezin ya Kurdistanê jî ji Komara Tirkiyeyê re ma ku li ser xirabeyên Dewleta Osmaniyan hatibû avakirin û mîrateyê wê wergirtibû.

Dewleta Komara Tirkiyeyê, hemû çand û nijadên vê erdnîgariyê ku li ser hatibû damezrandin, tune hesiband û bi feraseta nijadperestiyeke tekparêz a tirkîtiyê hat birêxistinkirin. Zext û zilma li ser gelê kurd roj bi roj dijwartir bû. Çand, ziman û nasnameya kurdan hat înkarkirin. Dewleta Tirk, ji bo helandina çand û zimanê kurdî û bi tevahî tunekirina gelê kurd, serî li gelek şêwazên derî aqil da. Her wisa di jiyana rojane ya civakê de zimanê kurdî hat qedexekirin, kurdî dibû sedemê cezakirinê.

Hemû hewldan û xwestekên kurdan yên azadî û mafên rewa bi tundiyeke bêhempa hatin serkutkirin. Kurd bi destezorî hatin koçberkirin. Armanca vê destezoriyê; valakirin û wêrankirina Kurdistanê bû û her wisa jî pêşîlêgirtina kemilandina çand û aboriya Kurdistanê bû.

Ev siyaseta red, înkar û darê zorê ku ji aliyê dewleta tirk ve li hemberî gelê kurd dihat meşandin, ji aliyê civaka tirk ve jî encamên wêranker afirand. Ew dahatên ku divê ji bo pêwistiyên civaka tirk yên wek kar, perwerdehî, tenduristî û hwd. bihatina xerckirin, jibo şerê li dijî kurdan dihatin bikaranîn. Bi vê yekê re, her ku çû pêla şoveniyê bi hêz bû û gav bi gav bû çandeke qewî ya ji jiyana civakê. Bandora hêzên mîlîtarîst a li ser sazî û dezgehên hikumet û dewletê zêdetir bû. Ew helwest û siyaseta nemirovane ku li hemberî gelê kurd dihat meşandin, her wisa pêşî li demokratîkbûnê jî girt.

Her çiqas di van salên dawî de bi bandora pêşkeftinên der û navxweyî derbarê nasname û zimanê kurdî de hin guhertinên erênî û di vê çarçoveyê de di wê siyaseta req de hin nermahî pêk hatibin jî, lê hê jî bêtehemûliya li hemberî azadiya gelê kurd didome. Bi van guhertinan re, her weha

niqaş û gengeşiyên derbarê çareseriya kêşeya kurd de jî bûye xaleke girîng a rojeva Tirkiyeyê. Lê belê, ligel van guhertin û pêşkeftinan jî pirsgirêka Kurdistanê hê jî li benda çareseriyeke mayinde ya li ser esasê wekheviyê ye.

Ev zext û zilma ku li dijî neteweya kurd tê meşandin, li parçeyên din ên Kurdistanê jî bi heman şêwazî didome. Pêşkeftin û destkeftinên li Başûrê Kurdistanê ku ji sala 1991an ve hatine bidestxistin ne tê de, li Îran û Sûriyeyê jî kurd ji hemû mafên xwe yên neteweyî û demokratîk bêpar in û Kurdistan ji statuya xwebirêvebirinê gelek dûr e.

## PÊNGAVA DÎROKÎ YA Lİ PÊŞBERÊ GELÊ KURD

Rapeçkirina mafên neteweyî û demokratîk ên gelê kurd, parçekirin û dabeşkirina Kurdistanê, neheqiyeke dîrokî ye ku tu aliyeke xwe yê rewa tune. Ev yek, sedemê sereke yê şer û tevliheviya siyasî ya li Rojhilata Navîn e. Şer, pevçûn, dûbendiya ku her diçe kûrtir dibe û nebûna demokrasiyê ku bi dehan sal e li Tirkiyeyê didome, di esasê xwe de encama neçareserkirina pirsgirêka kurd û Kurdistanê ye.

Daxwaza gelê kurd ku dixwaze di welatê xwe Kurdistanê de bi şêwazeke azad û serbilind bijî, mafê wî yê esasî ye ku ji netewebûna wî tê. Ev maf, her wisa ji aliyê peyman û belgeyên navneteweyî ve hatiye mîsogerkirin ku berhem û danhevên têkoşîna hevbeş a mirovatiyê ne. Sazkirina aştî û dadweriyeke gerdûnî ya li dinyayê, girêdayê neteweya kurd e ku di nav neteweyên dinyayê de, bi serbilindî cihê xwe bigre.

Ji ber vê yekê ye ku pêngava dîrokî ya li pêşberê gelê kurd, azadiya neteweyî ye. PSK, azadiya neteweyî ya gelê kurd, di destxistina mafê çarenûsiyê de dibîne. Divê gelê kurd bikaribe bi serbestî çarenûsa xwe diyar bike û bibe xwedî mafê xwebirêvebirinê.

Raya partiya me ev e ku li Bakurê Kurdistanê ev yek dikare bi du şêwazan pêk were. Yek jê, mafê gelê kurd e ku bikaribe dewleta xwe ava bike. Ya din jî dikare bi gelên Tirkiyeyê re yekîtiyeke demokratîk hilbijêre.

Em wek partî, terefdarê federasyoneke demokratîk in. Divê li Tirkiyeyê pergala federalîyê bê avakirin û Kurdistan jî di nav de bibe xwedî statuyeke federe. Divê

Kurdistana federe jî parlamento, hikumet û organên xwe yên daraziyê hebin. Divê gelê kurd jî li Tirkiyeya federel bi gelê tirk re xwedî heman mafan be.

Divê bê zanîn ku pêkhatina azadiya neteweyî jî tenê bi têkoşîna gelê kurd pêk tê.

Jibo vê yekê jî divê hemû hêzên neteweyî; hemû çîn û tebeqeyên azadîxwaz, xwedî dîn û baweriyên cûda, partî, rêxistin û saziyên welatparêz ku temsîliyeta piraniya civakê dikin, li ser zemîna têkoşîneke hevbeş bibin yek.

## PSK; HÊJAHÎ Û AWAYÊ TÊKOŞÎNA WÊ

Navê partiyê, Partiya Sosyalîst a Kurdistan e. Tirkiya wê, "Kürdistan Sosyalist Partisi" ye. Navê wê yê kurt, PSK ye. Remza alaya wê; li ser zemîneke sor, rojeka bi 21 tîrêj heye û di nav rojê de bi kurtî navê partiyê hatiye nivîsandin. Navenda Giştî ya Partiyê wek fermî li Enqereyê ye. Navenda xebatê li Amedê ye.

PSK, li mîrateyê têkoşîna azadiyê ya gelê kurd ku ev du sed sal in dom dike, xwedî derdikeve.

Kevneşopiya siyasî ya PSK-Riya Azadî ku di dawiya sala 1974an de hat damezrandin, têkoşîna xwe ya rewa, demokratîk û aştiyane ku heta niha bi navgînên gelek cûda pêk aniye, dê ji niha û pê ve di şert û mercên nû de bidomîne.

Di esasê xwe de qada têkoşînê ya PSKê, Bakurê Kurdistanê ye ku di nav sînorên Tirkiyeyê de ye.

PSK, partiyeke azadîxwaz, welatparêz, demokratîk û sosyalîst e. PSK, partiya hemû kedkar, gundî, kesên desteng, rewşenbîr, çîna navîn û aligirên demokrasî, azadî û wekheviyê ye. Ji bo maf û azadiya hemû hindikahiyên nijadî û dînî ku li Kurdistanê dijîn, têdikoşe.

Wek hemû gelên din, mafê gelê kurd e jî ku li dijî zilm û kiryarên hov û nemirovane bi hemû navgînên têkoşînê li ber xwe bide. Lê belê, ezmûnên li welat û herêmê daye nîşandan ku bi şer û tûndîyê, pirsgirêk nehatine çareserkirin, berovajiyê vê yekê bêtir tevlihev bûne. PSK, terefdarê wê yekê ye ku hemû cûreyên pirs û pirsgirêkan, bi riyên danûstendin, hevdîtin û rêbazên aştiyane bên çareserkirin. Ew, şert û mercên demê li ber çav digre, bi rê û rêbazên aştiyane ku encamên rasteqîn

bidest bixe, têdikoşe. Di xebat û têkoşîna xwe de rêbaz û navgînên meşrû, demokratîk û sivîl bi kar tîne.

PSK, di kar û şixulînên navxweyî de pirdengî û di hemû merheleyan de nirxên demokrasiyê esas digre û vê yekê girîng dibîne. Bi şêweyeke zêdetirîn hewl dide ku endam û alîgirên partiyê, beşdarê prosesa biryargirtinên girîng bibin. Li gor rewşê, serî li referandûma navxweyî dide. Li hemberî alîgirên xwe û raya giştî, hemû xebat û kiryarên xwe bi şêweyekî eşkere dike û hesabdayînê ji xwe re dike rêgez.

PSK di têkoşîna siyasî de bi şanaziyeke mezin qedrê serweriya dadmendiyê, rêgezên demokrasiyê, rûmet û mafên mirovan digre.

Partiya me, girîngiyeke mezin dide peymanên navneteweyî yên têkildarê maf û azadiyên mirovan ên wek Daxuyaniya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî, Rêxistina Hevkarî û Ewlekarî ya Ewrûpayê, Şertê Parîsê, Belgeya Pişkdarî ya Tevlîbûna Yekîtiya Ewrûpayê, Pîvanên Kopenhagê û hwd.

Partiya me xwedî li îdealên demokrasiya rasterast derdikeve ku ew derfet dide mirovan ku di her astê de tevlî biryarên bi jiyana xwe ve girêdayî ne, bibin. PSK hewl dide demokrasiyeke beşdar avabike ku tê de polîtîkayên herêmî û beşdariya biryaran a di asta herêmî de diyarker e.

Partiya me, dijayetiya şer, mîlîtarîzm û di serî de ya ku ji aliyê dewletê ve tê bikaranîn, hemû cûreyên tundiyê dike.

PSK, xwedî li hêjayiyên gerdûnî û hevpar ên mirovatiyê wek azadî, wekhevî, dadwerî, aştî û piştevanîyê û li daneheva têkoşîna dîrokî ya di vê riyê de xwedî derdikeve û didomîne.

PSK, dahatûya mirovatiyê ya demdirêj di sosyalîzmê de dibîne. Ji bo azadbûna mirovan a bi her awayî û pêşkeftina wan a piralî, bi sosyalîzmê bawer e. Sosyalîzm, ji bo bi dawîbûna hemû cûreyên kedxwarî û tadahiya di jiyana civakî de, azadî û wekheviya rasteqîn e.

Sosyalîzm ji bo Kurdistanê niha hedefeke nêzîk nîne. Piştî azadiya neteweyî, sazkirina civakeke demokratîk, pêşkeftin û kemilandina çand û aboriya neteweyî û bi

giştî kemilandina civakê ya ji bo sosyalîzmeke serkeftî, dê demeke ku em ji niha ve nikarin hîzrbikin, bigre.

## PIRSGIRÊKA DEMOKRASIYÊ

PSK, di wê baweriyê de ye ku têkoşîna maf û azadiya gelê kurd û demokratîkbûna Tirkiyeyê bi hevûdu ve girêdayî ye. Ger li Tirkiyeyê demokrasiyeke li gor standartên gerdûnî bi cih bibe, dê ev yek ji bo serkeftina têkoşîna azadiya neteweyî ya gelê kurd bibe derfeteke girîng. Her wisa, azadbûna neteweya kurd jî wê demokratîkbûna Tirkiyeyê hêsantir bike.

Ji ber vê yekê ye ku partiya me, di têkoşîna azadiya neteweyî de gelên Tirkiyeyê û hemû hêzên demorasîxwaz dost dibîne û girîngiyeke mezin dide hevkarî û têkoşîna hevpar a bi wan re.

Ji ber ku Tirkiye welatekî pirreng e û gelek çand, ziman, dîn, netewe û kêmneteweyên cûda di nav xwe de dihewîne, pergala herî guncav ku lê bê, federalîzm e. Ev pergal derfet dide ku herêm, nijad û civatên dînî yên cûda jî bêtir tevlî birêvebiriya welêt bibin. Pergaleka federalîzmê ne tenê pirsgirêka Kurdistanê çareser dike, her

wisa bi awayeke berfireh zemîna bi sazgehbûna demokrasiyeke pêşkeftî jî amade dike.

Partiya me, ji bo bi dawîbûna pergala otorîter, nijadperest û tekparêz a li Tirkiyeyê,

Sazkirina demokrasiyeke li gor standartên gerdûnî,

Dawîlêanîna serwêrisiya mîlîtarîzmê,

Bidestxistina maf û azadiyên hemû hindikahiyên nijadî û civatên dînî,

Di şûna pergala siyasî ya navendparêziya hişk de avakirina rêvebiriyên herêmî,

Li gorî binyata pirnetewe, pirziman, pirçand, pirdînî û pirmezhebî ya li Tirkiyeyê amadekirina makezagoneka nû,

Qebûlkirina hebûna gelê kurd, bo Kurdistanê pejirandina statuyeke federe,

Di çarçoveya azadiya raman, dîn, bawerî û wijdanî de bi şêwazeke adilane çareserkirina pirsgirêka Elewîtiyê,

Girîngiyeke mezin dide têkoşîna ji bo birêxistinbûna Tirkiyeyeke federal û ji bo vê yekê jî pêdivî bi têkoşîneka hevbeş û bandêr a hêzên demokrasî û guherînxwaz dibîne.

## KURDÊN KU LI TIRKIYEYÊ DIJÎN

Di encama polîtîkayên red, înkar, tunekirin û koçkirinê de ku bi sedan sal in li hemberî gelê kurd tên bikaranîn, kurd neçar man ku bi girseyî Kurdistanê vala bikin û li bajarên rojava cîwar bibin. Ev koçberiya bi destezorî, ji hêlek ve kurdan wek civakî lawaz kir, ji hêlek ve jî prosesa pişaftina kurdan lezand.

Kurdên ku li Anatoliya Navîn û herêmên rojavayê Tikiyeyê dijîn, eynî wek ên li Kurdistanê ji hemû mafên xwe yên neteweyî û demokratîk bêpar hatine hiştin. Kurdên van deran jî nikarin bi nasnameya xwe bijîn, derfet nehatiye dayîn ku bi zimanê zikmakî perwerde bibin, bikaranîna zimanê kurdî ya di qadên gelemperî de hêj jî qedexe ye. Ji hemû derfetên hînbûn û pêşvebirina ziman, çand û dîroka kurdî bêpar in.

Partiya me, di prosesa bidestxistina mafê xwe yê rewa de, terefdarê wê yekê ye ku kurdên li rojavayê Tirkiyeyê dijîn, bi dilê xwe vegerin ser axa bav û kalan.

Dîsa jî tê zanîn ku rêjeyeke girîng a kurdan, wê Rojava û Naverasta Anatoliyê wek cih û war ji xwe re qebûl bikin.

Partîya me dide zanîn ku wek hemû hindikahiyên etnîk û dînî, kurdên di vê rewşê de ne, divê li gor çand û nirxên xwe yên neteweyî û bi awayeke azad bikaribin bijîn û her weha perwerdehiya bi zimanê zikmakî ji bo vê girseyê mafekî gerdûnî û demokratîk e.

Cihên ku nifûsa kurdan ji rêjeyeke destnîşankirî derbas dibe, divê mafê perwerdehiyê bê bicihanîn û ji bo bikaranîna hemû mafên gelemperî derfet bên çêkirin. Ji bo kurd li cihên ku lê dijîn (bajar, navçe, herêm) beşdarî prosesa siyasî û îdarî bibin, partiya me hewl dide ku rêgeza li cihê xwe birevebirin bê cîbicî kirin û ji bo vê yekê jî têdikoşe.

## TÊKILÎYÊN BI PARÇEYÊN DIN YÊN KURDISTANÊ RE

Partiya me, ji bo gelê me yê li her parçeyên Kurdistanê mafê çarenûsiyê diparêze.

Di sala 1991an de, bi tesîra rûdan û pêşketinên li herêmê, rê li ber Başûrê Kurdistanê vebû ku azadiya xwe bi dest bixe. Ji sala 2005an pê ve jî statuyeke federalî bi dest xist. Tecrûbeyên azadî û demokrasiyê yên li Başûrê Kurdistanê, ji bo avakirina aştî û aramiya herêmî rolekî xwe yê girîng heye. Her wisa, ji bo çareseriya pirsgirêka kurd a li parçeyên din jî firsendên girîng pêk tîne.

PSK, nirxekî mezin dide destkeftiyên gelê me yên li Başûrê Kurdistanê û bidestxistina statûya federalî ya li vî parçeyê welatê me jî wek pêşketineke dîrokî bi nav dike. Van destkeftiyan, wek yê xwe dizane, piştgirîdayîn û xwedîlêderketina li van destkeftiyan wek erkekî neteweyî dizane. Her wisa, hewldana gelê me ya li Başûrê Kurdistanê ku pêwist bibîne ji Iraqê veqete û dewleta xwe ya serbixwe ava bike, wek mafekî rewa dibîne û piştgiriya wê dike.

Partiya me, bi şêwazekî çalak piştevaniya têkoşîna azadiya neteweyî ya gelê me yê li Rojava û Rojhilatê Kurdistanê dike.

Ji hêleke din ve, têkoşîna azadiyê ya li her parçeyê welatê me, her wisa bi têkoşîna gelên din yên cîran ve têkiliyek xwe ya qewîn heye û di bin bandora rewşa siyasî, civakî û dîrokî ya van welatan de dimîne. Li gorî rewşê, têkoşîna li her parçeyê welêt dibe ku ji hev cûda be, di demên cûda de bi encam bibe û bigihîje encamên cûda. Li her parçeyê, birêxistinkirin û birêvebirina têkoşînê, divê di bin erk û berpirsiyariya rêxistin û saziyên welatparêz ên wan parçeyan de be.

PSK, ji bo azadiya gelê me girîngî dide piştevanî û hevkariya rêxistinên welatparêz ên li parçeyên din, di çarçoveya berjewendiyên tevgera neteweyî de ger pêwist bibîne, rexneyên dostane dike, lê belê têkildarê karên navxweyî yên rêxistinên parçeyên din nabe.

PSK, sedem çi dibe bila be, her tim li dijî şerê birakujiyê ye, bikaranîna tundiyê ya di navbera rêxistinên kurd de napejirîne û di çareserkirina pirsgirêkên navxweyî de jî girîngiyeke mezin dide diyalog û rêbazên aştiyane.

## KURDISTANA FEDERE YA DEMOKRATÎK

### Hedefên Siyasî

Li gorî hêmanên hilbijartina giştî ya yek qedemeyî, veşartî û wekhev ku hemû partî bi azadî beşdar bibin, dê Parlamentoya Kurdistanê bê avakirin ku li Kurdistanê mafê xwe yê desthilatiya qanûnçêkirinê û hikumetdanînê hebe.

Parlamentoya Kurdistanê ji bo birêvebirina Kurdistanê, ji bilî wan desthilatiyên ku di makezagona navendî/federal de hatine diyarkirin, dikare di hemû waran de erka xwe ya qanûndanînê bi kar bîne.

Karîna birêvebirinê, dê ji aliyê hikumeta ku di parlamentoyê de bi şêwazekî lihevkirî û li ser esasên demokratîk hatiye sazkirin ve bê bikaranîn.

Dê pergaleke dadmendiya demokratîk bê avakirin ku di nav xwe de, yekpareyî, bêalîtî û serbixwetiya daraziyê û ewlahiya dadger dihewîne.

Dê ji bo hilbijartin û partiyên siyasî pergaleka hevdem, berfirevan, pişkdar bê çêkirin ku Pîvanên Venedîkê esas bigre.

Li Kurdistanê, parêzgar, qeymeqam û gerînendeyên asayîşê dê bi hilbijartinê bên ser kar.

Dê mafên demokratîk û neteweyî yên hemû civakên dînî û nijadî ku li Kurdistanê dijîn, bên dayîn û derfet bên avakirin ku ew tevlî birêvebirina siyasî û kargêriyê ya welêt bibin.

Pergala kargêriyê ya li Kurdistanê, dê bi awayê bihêzkirina rêvebiriyên herêmî bê sazkirin. Dê rêvebiriyên cîdayî bên xurtkirin, şaredarî û meclisên giştî yên bajêr li gorî prulariya civakê bên birêxistinkirin ku her yek ji wan bibe dezgeheke demokrasiyê.

Bêyî ku ji aliyê dîn, ziman, nijadî û zayendî ve di nav mirovan de ferqî pêk were, ji her kesî re bi awayeke berfireh azadiya raman, bawerî, axaftin, ragihandin, birêxistinbûn û xwepêşandanê bê dayîn.

## Avakirina Aboriya Neteweyî

Rewşa xirab ya aboriya welêt ku ji ber paşdehiştinê pêk hatiye, dê di demek lezgîn de bê başkirin û ji bo avakirin û kemilandina aboriya neteweyî ya di berjewendiyên gel de, dê bi feraseteke seferberî bê tevgerandin.

Ji bo pêşxistina zanistî û teknolojiyê, dê bi her awayî tedbîr werin girtin û ji bo aboriyeke hevdem ji hemû derfetên zanistî sûd were girtin.

Dê dam û dezgehên pîşesaziya giran ku zerarê nedin xweza û hewirdorê, bên damezrandin.

Dê rê li ber bê vekirin ku teknolojî û sermayeya biyanî bê welêt.

Dê di warê cotyarî û çandiniyê de rê û dirbên teknîka nûjen bên bikaranîn.

Ji bo parastina esnafên biçûk û pîşakaran, dê tedbîrên pêwist bên girtin.

Ji bo di di warê avdanî û hilberîna enerjiyê de ji çem û robarên Kurdistanê sûd

weregirtin, dê lêkolîn û xebatên pêwîst bên kirin.

Ji bo derxistin û bikaranîna dewlemendiyên sererd û binerd ên Kurdistanê, dê rê û dirbên hemdem bên bikaranîn û dê ev dewlemendî ji bo geşdariya civakê bê xerckirin.

Dê potansiyela geşt û guzariya welatê me, bi awayeke zêdetirîn bê qîmetdarkirin.

**Çandinî**

Erdnîgariya welatê me, di warê çandiniya bi teşîd û berdayîna zêde gelek dewlemend e ku dikare di qada navneteweyî de reqabetê bike.

Ji bo teşvîqkirina çandiniya organîk, nûjenkirina pergala avdaniyê û zêdekirina cûreyên beran, dê xebat bê kirin.

Dabeşkirina zeviyên çandiniyê yên di navbera ferdên malbatê de, dem û dezgehên berhemanînê biçûk kiriye. Ev yek, berhemdarî û qezencê kêm dike. Jibo rê li ber girtina vê yekê, dê di warê çandiniyê de kooperatîfbûn bê teşvîqkirin,

amarên nûjen ên çandiniyê bên dabînkirin, derfet bên peydakirin ku gundiyên hilberîner fêrî teknîka çandiniyê bibin û bi kar bînin.

Dê ji wan hilberînerên ku bi çandiniyê ve mijûl dibin re, krêdiya pêwist bê dabînkirin, kedkarên gundî ji mêtîngeriya selfdaran bên rizgarkirin û selfdarî bê qedexekirin.

Ger çandinî nebe, pêşketina bi îstîqrar ne mimkûn e. Ji bo temînkirina xurdemeniyên pêwist û ewle, pêşxistina gundewariyê, geşedaniya aboriyê û hawirdoriyeke jiyanbar, dê xaka çandiniyê bi şêwazeke kêrhatî bê bikaranîn û her wisa, dê piştgirî bê dayîn ku bi awayeke nûjen dermaletî bê kirin.

Dê têkiliyên xulamî-koletiya demêderî ku ji serdema feodaliyê maye û hê jî li herêma gundewariyê didomin, bên bidawîkirin.

## Bikeyskirina Jiyana Xebatê

PSK, di jiyana civakî de dê girîngiyê bide parvekirina adil û wekhev û di bikeyskirina

jiyana xebatê de jî dê hêmana dadiya civakî wek rastiyekê ji xwe re qebûl dike.

Di rêkûpêkkirina jiyana kar û xebatê de, dê li gor binemayên ILO bê tevgerîn.

Dê ji bo hemû xebatkaran mafên bi sendîkabûyîn, peymandanîna komelî û karberdanê bê dayîn.

Sîgortaya bêkariyê jî di nav de, dê pergaleke ewlehiya civakî bê çêkirin.

Temenê teqawidiyê, dê li kêmûzêdeyeke temenê li Kurdistanê, mercên din û stendardên navneteweyî bê diyarkirin.

Dê ji hevjîn û zarokên şehîd û mexdûrên têkoşîna azadiyê re mûçe bê girêdan.

Dê herkes li gorî keda xwe destmizê werbigire.

Ji bilî ew karên ku bi malbatî tê kirin û zerarê nade tenduristiya zarokan, xebitandina kesên ku temenê wan ji 16 salan biçûktir in, dê bê qedexekirin.

Dê xebatkar jî bikaribin beşdarê birêvebirin û venêrîna kargehên xwe bibin.

Ji bo ku herkesê xebatkar bibe xwedî derfeta bêhnvedan û betlaneya bidestmiz, dê tedbîrên pêwist bên girtin, jibo xebatkarên çandiniyê jî dê ewlahiya civakî bê dabînkirin.

**Azadiya Baweriyê û Laîktî**

Dê karên dînî û dewletê ji hev bên cûdakirin. Dê dewlet ji hemû baweriyên dînî re di heman mesafeyê de be û bibe garantiya hemû aliyan ku bikaribin bi şêwekeye azad, pêdiviyên xwe yên dînî bi cî bînin. Dê herkes di baweriya xwe ya dînî de azad be, tu kes ji ber baweriya xwe ya dînî rastê zordestiyê neyê û nebe xwedî ciyawaziyê.

Dê mafên baweriyê yê hemû dîn û civakên li Kurdistanê yên wek Keldanî, Suryanî, Ermenî, Êzdî, Elewî ku bi dehan sal in bi tevkuştin, teda û zilmeke bêhempa re rû bi rû mane, bê dabînkirin. Dê ji bo hemû sazî û dezgehên îbadet, perwerdehî û civakî yên van derdoran statuyeke yasayî ya xweser bê dayîn ku bikaribin bi azadane pêdiviyên xwe yên dînî bi cî bînin.

## Çand û Perwerde

Li Kurdistanê zimanê fermî dê bi kurdî be. Ji bo zaravayên kurdî yên li Bakurê Kurdistanê tên axaftin (kurmancî û zazakî) di radeyeke wekhev de bipêşkevin û bikemilin, dê hewl bê dayîn. Pevkelijandina herdu zaravayan û pirsgirêka zimanekî yekgirtî, dê li hêviya prosesa xwe ya xwezayî bê hiştin.

Di qonaxên perwedehiyê de dê rêgeza pirzimanîyê bê bikaranîn. Li gorî xwestinê, ligel zimanê kurdî, zimanê tirkî jî bibe yek ji zimanê perwerdehiyê.

Dê derfet bê dayîn ku zimanê zikmakî yê civakên nijadî yên li Kurdistanê jî bibe zimanê perwerdehiyê û li deverên ku piranî ne, bibe zimanê fermî.

Perwerdehiya seratahî, dê heta 16 salîyê bêgavî û bêdirav be.

Ji bo bi awayeke berfireh hînkirin, pêşvebirin û kemilandina zimanê nivîsandinê û wêjeya kurdî ku heta niha di bin zext û bandoreke dijwar de bûye û lawaz hatiye hiştin, dê karên pêwist bên kirin û ji bo bikaranîna wê ya di dibistan,

çapemenî û hemû warên jiyanê de, bikeyskirinên pêwist bên çêkirin.

Dê di warê perwerdehiyê de polîtîkayeke demokratîk û zanyarî bê ajotin û hemû qonaxên perwerdehiyê di bin ronahiya aqil û zanistiyê de bê birêvebirin. Dê hemû zanîngeh xweser bin, li gorî nirxên hevdem bibin war û hêlîna zanyariyê û li gor pêdiviyên demê mufredateke zanist û teknolojîk pêk bînin.

Ji bo herkes bikaribe di warê çand û hunerê de xwe pêş bixe, dê derfetên pêwist bên dabînkirin.

Ji bo derxistin û parastina berhem û bermahiyên dîrokî, çand û hunerî yên li Kurdistanê, dê xebatên pêwîst bên kirin û ji bo xizmeta civakê wê bên bikaranîn.

**Mafên Jinan**

Dê tedbîrên pêwist bên wergirtin ku jin jî azad bibin û ligel mêran di heman şert û mercan de tevlê jiyana xebatê, siyasî û civakî bibin. Her wisa, heta ku bi mêran re wekhev bibin, dê ji bo wan hêmana cûdakeriya erênî bê bikaranîn.

Dê ji bo jinan di warê xebatê de mecala wekheviyê bê dayîn, ji heman karî re heman destmiz bê dayîn û ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinan yên ji ber welidandinê, dê tedbîrên yasayî bên dabînkirin.

Dê hemû cûreyên tada û biçûkxistinê yên li hemberî jinan bên rakirin; lêdan û tundiya li dijî jinan a nav malê, dê wek sûc bê hesibandin û ji bo pêşîlêgirtina li vê yekê, tedbîrên pêwîst bên wergirtin.

Ji perwerdehiya jinan re girîngiyek taybet bê nîşandan û derfet bê dabînkirin ku bikaribin bi awayeke wekhev ji hemû derfetên perwerdehiyê sûd werbigirin. Ji bo pêşkeftina hestyariya civakê ya li hemberî mafên jinan, dê polîtîkayeke perwerdehiyê bê pejirandin ku li dijî cûdakeriya zayendî be.

Dê hemû kevneşopiyên wek qelend, berdêl, pirjinîtî û zewaca bi destezorî û bi zaroktî bên qedexekirin.

## Ciwan û Zarok

Ji bo gihandina ciwanên nojdar ên di warê beden û giyanî de û ji bo perwerdekirina

wan bi berpirsyariyeke civakî û nirxên hevdem, dê tedbîrên pêwist bên girtin.

Dê girîngiyeke taybet pê bê dayîn ku ciwanên bîrewer, bixwebawer ku bikaribin derbarê pêşeroja xwe de biryarên rasteqîn bidin, bên têgihîştin.

Dê ji her alî ve bê bikesykirin ku ciwan bikaribin bi awayeke çalak, tevlî jiyana siyasî, çandî û civakî bibin.

Di warê nojdariya giyanî û bedenî ya ciwanan de, dê girîngî bi werzişê bê dayîn, her wisa dê navendên çandî yên ciwanan bên vekirin.

Partiya me, di wê baweriyê de ye ku mafên zarokan, bi ducantiyê dest pê dike. Ji ber vê yekê ye ku partiya me, di nav tevdebûniyekê de li nojdariya dê û zarok dinihêre; ji bo gihandina zarokên nojdar ên di şert û mercên baş de, hem di nav malê de hem jî li derve, dê tedbîrên pêwîst bigire. Partiya me, li gorî Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî, dê bikaranîna hemû derfetên xwe ji bo hemû zarokan dahatûyeke ewledar, jiyaneke nojdar û perwerdehiyeke hevdem dabîn bike. Di perwerdehiya zarok û ciwanan de,

dê rêgeza perwerdehiya bi zimanê zikmakî esas bigire.

**Tenduristî û Xizmetên Civakî**

Dê ji herkesî re heman xizmeta tenduristiyê ya belaş, jîndewar û nîgehdar bê dayîn.

Ji bo dawî li xizanî û birçîbûniyê bê, dê tedbîrên bandêr bên wergirtin.

Dê li dijî hemû cûreyên bêkarî têkoşîn bê dayîn; dê hewl bê dayîn û derfet bên peydakirin ku herkes bikaribe debara xwe bike.

Derbarê tenduristiya gel de, dê tedbîrên pêwîst bên girtin; dê di hemû nexweşxane û saziyên tenduristiyê yên gelemperî de pelandin, tedawî-lênihêrîn û derman bêdirav bê dabînkirin.

Ji bo zarokan, bi qasî ku têr bike, dê zarokxane bên vekirin; zarokên bêxwedî, dê ji aliyê dewletê ve bên xwedîkirin.

Lênihêrtin û xwedîkirina nexweşên mexdûr, kesên astengdar û kûd û kal û pîran, dê ji aliyê dewletê ve bê kirin.

## Xanî û Bajarvanî

Piraniya civaka kurd ku hê jî di wan stareyên kevnare û nesaxlem de dijîn û gelek caran dibin qurbaniyên karesatên wek erdhêj, aşît, hezaz û laseran, dê hewl bê dayîn ku ji van şert û mercên dijwar bên xilaskirin.

Ji her malbatî re, li gorî pêwistiyê hêwirgehên nûjen û saxlem bên dabînkirin; dê kirê bên venêrîn û ji yên hewcedar re alîkariya kirê bê kirin.

Di prosesa bajarvaniyê de, dê ji her alî ve li ser xweza, dîrok û civakê bi tevahî bê sekinîn.

Di plansaziya avadaniyê de; ji bo kêmkirina gemariya hewayê, zêdekirina deverên bi dar û ber, di hêsantirkirina hatûçûnê de girîngî pêdayîna vegûhastina tomerî û ji bo sûdwergitina ji çopê, avakirina saziyên dêrandin û veguherînê ya bi teknolojiyeke nûjen, dê xebat bên kirin.

Dê peywira me ya pêşdatir ew be ku ji bo mexdûrên koçberiya bi destezorî, li gorî xwesteka wan jîngehên hemdem bên avakirin. Di bajarbûnîyê de; dê cihwarên civakî ku tevkariya pêşketina kesane ya hemû aliyên civakê bike, navendên tenduristiyê, zarokxane, bazarên taxê, navendên hunerî, çand û werzişê, qadên geryan û leyistikê û hwd. bên avakirin.

Ji bo ji nû ve bikeyskirina kolîtbûnî û bajarbûniya çelexwarî ya heyî û avakirina jîngehên hemdem û nûjen, dê li gorî her cî taybetmendiyên wê yên civakî, çandî û xwezayî li ber çav bê girtin û nexşeyên vegûherîna bajariyê bên amadekirin û bikaranîn.

Di cîwarbûn û avakirina xaniyan de, dê muqateyê astengdaran be, girîngî bide paqijiya hewayê, seyrangehan ava bike, parastina hêşînayiyê bike û hişmendiya bajarsaziyeke hemdem ku biplan be, bişopîne.

**Jîngeha Xwezayî**

Dê xweza û jîngeh bê parastin, di warê pîşesazîbûn û bajarbûyînê de dê tenduristiya nifşên dahatûyê bê esasgirtin.

Dinya mala me hemûyan e û bi vê mebestê hemû kiryarên ku hevsengiya ekolojîk a dinyayê xirab dikin, dê bên rawestandin. Her wisa, pîşesazî, bajarsazî û xebatên enerjiyê jî dê li gorî parastina xwezayê bên bikesykirin. Ji bo xwedîlêderketin û parastina xwezaya dinya û welatê me ku ji nifşên dahatuyê emanet e, dê bi aliyên pêwendîdar ên dinyayê re hevkarî bê kirin.

Parastina daristanan, berfirehkirina qadên daristanî; ji bo parastin û zêdekirina çivîk, masî û ajalên din ên nêçîrê û nebatan, bi kurtî hemû dewlemendiyên xwezayê û pêşîlêgirtina xerabûna xwezayê, dê tedbîrên giran yên jidil bên wergirtin, jiyana kovî bê parastin, nêçîrvanî bê qedexekirin.

Zêdebûna nifûsê, bajarbûni û pîşazîbûyîna bêplan û bi şêwazeke hovane bikaranîna jêderên xwezayî, dibe sedemê xerabûn,

qilêrbûn û gemarbûna xwezayê, axê, avê û hewayê.

Germayî, ronayî, xwarin û vexwarin, cil û berg hêwirgeh ku jibo jiyanê pêwist in, qadên hêşînayî û bi dar û ber ku pêdiviya tenduristiyê ne û kêfa jiyanê zêde dike, dê bi rêbazên ku tên nûyandin û herî kêm rûxandin pêk tînin, bikin bin xizmeta mirovan.

Herêmên pîşesaziyê, dê li cihên ku binesaziya wê hatiye temamkirin û tesîrê li jiyangehan nake, bên avakirin.

Derbarê mijarên wek jîngeh û germbûna kadî de, dê ji hevkariya bi hêz û saziyên pêwendîdar ên navneteweyî re girîngîyek taybet bê nîşandan.

**Kurdên Derveyê Welêt**

Partiya me, piştgirî dide hewldana birêxistinbûn û têkoşîna daxwazên mirovî, çandî, civakî û aborî ya kurdên ku ji ber sedemên cûda derketine derveyê welêt. Her wisa, girîngiyeke mezin dide alîkarî û piştgirîya ku ew didin têkoşîna azadiya neteweyî ya gelê me.

Partiya me, kurdên derveyê welêt, beşeke livdar a ji têkoşîna azadiya neteweyî ya gelê me dibîne, xebat û hewldanên wan ên ji bo peydakirina piştgiriya navneteweyî diecibîne û birûmet dizane.

## Pêwendiyên Navneteweyî

Ji bo welatê me jî nêzî Yekîtiya Ewrûpayê bibe û pê re bibe yek, dê bi şêwazeke çalak kar û xebat bên birêvebirin.

Di çareserkirina pirsgirêkên herêmî û navneteweyî de, dê rê û rêbazên danûstendinên aştiyane bên esasgirtin.

Dê hewl bê dayîn ku bi welatên cîran re aştiyeke mayînde bê sazkirin.

Ji bo dawîlêanîna biçekbûnê ya li dinyayê, çareserkirina pirsgirêkên germbûna kadî û hwd.,. parvekirineke adil û serfkirina jêderan bo dinyayeke xweştir, dê helwesteke çalak bê ajotin.